

Rejîm dixwaze  
dîroka me ji nav

bibe!

»»» R:7



Cezayek  
bê sînor bo  
dewletek bê yasa

»»» R:4



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (373) 05-05-2020 Buha (1000) Tûmen

Per û baskê  
terorê divê bêne  
kurtkirin

»»» R:6



Qirkirina Kurdên Efrînê  
li ser destê çeteyan di bin  
dagirkeriya Tirkîyê de

»»» R:8



## Veşartina krîzê bi krîzan

**D**i halekê de ku krîza Koronayê bal bi ser hemû cîhanê de kêşandîye, û xelkên Îranê bi hemû tex û qatên xwe ve rewşeke diwartir derbas dikin, nebûna birêveberîyeke kêrhatî û neşarezayîya berpîrsên rejîma Îranê bûye sedema vê ku vîrûsa Korona di Îranê de berbilav bibe, û bi awayekî ku jiyana xelkê çend qat zêdetir ji berê taltir bûye.

Di van rojan de kedkar rewşeke diwar û dilêş derbas dikin, rewşeke gelek xirab bi ser kar û jiyana kedkaran û qata hejar ya civatgehê de hatiye sepandin. Bi liberçavgirtina bil-indbûna çend hember a nîrxan, û daketina şiyana kirîna kedkaran, bo malbatên kedkaran ew yek gelek cihê nîgeraniyê ye, û eva jî di demekê de ye, ku berpîrsên rejîmê ku dest bi ser hemû çavkanî û samana vê xelkî de girtiye, û heta soz û qewlên direw didin xelkê.

Mijarek ku di wê dawiyê de nîgeraniyek zêde li cem xelkên kêmdahat çê kiribû, derkirin û kêmkirina kedkarên şirket û kargehan in, û gelek kedkar nemaze kedkarên ku rojane heqdeştê xwe wer-



digrin, di heyama rojên derbasbûyî de li ser kar derkirine, bêtir vê ku ji aliyê rejîmê ve tu girîngîyek bi rewşa wan bê dayîn.

Nebûna yasayeke bihêz bo piştevanî ji kedkaran, krîzên nebûna kar, nebûna ewlehiya pîşeyî û nebûna îmkanatên tendirustî bo pêşgirtin ji tûşbûna bi vê nexweşiyê, nîgeraniyeyeke zêde di hember rewşa kedkaran de pêk anîye.

Di halekê de vê krîzê, bandor li ser aboriya zêdetir ji 190 welatên cîhanî daniye, lê piraniya welatan bi birêveberîyeke dirust û rêkarên baş wekî "mîafiyeta malîyatî" û alîkariya malî bi wan kesên ku bi sedema wê rewşê bêkar mane, alîkariya xelkên xwe dikin. Lê beravajî di Îranê de bi sedema nebûna yasayeke serast bo piştevanîkirin ji qatên xwarê yên civatgehê em dibînin ku ew qat di civatgehê de, ne tenê dibin yekem qurbanî belkî hegera nehêştin û jinavçûnê jî li ser wan e.

Çend roj beriya niha, cihgirê berpîrsê karûbarê aborî li Wezareta Kar û Xweşbijîvî ya Civakî ya rejîma Îranê, di raporekê de li hember bandorên berbelavbûna vîrûsa Korona li ser aboriya Îranê hişdarî dabû û ragihandibû: Zêdetir ji 40 milyon û 800 hezar kes ji ewên ku karên wan heye, metirsiya wê yekê ji ser wan e ku karên xwe ji dest bidin, û rewşa kar û kasibî piştî berbelavbûna Korona ber bi haleteke krîzî ve here. Rejîma Îranê bi berdewamî û bi awayekî sîstematîk hemû mafê neteweyên din yên Îranê bînpê kiriye, û zêdebûna nîrxê çarereşî di wan

parêzgehan de hewlek e bo vê ku xelkê wan parêzgehan di hejariyê de bêhêle.

Eva ew rewşa bikrîz e, ku bo qata hejar ya civatgehê hatiye afirandin; Lê hevdem digel vê yekê jî, pîrsek ku cihê nîgeraniyê ye û mînak wê jî tenê li civatgeha belalêdayî ya wek Îranê tê dîtin, tirs ji eşkerekirina zaniyarî û belavkirina raştîyan e!

Di civaka dîktatorlêdayî de, pîrsa herî bitehlûke bo deştîlatê, derketina raştîyan e, ew rewş niha di Îranê de bi giştî tê xuyakirin, wek mînak, Dr. Rehîm Yûsîf-pûr ku di wan rojan de, nasnavê "Duktorê Raştbêj" li Îranê di nav torên civakî de pê hatiye dan, di vîdyoyekê de, bi eşkere û rasteraşt bas ji banghêşkirina xwe û gefên navendên ewlehî û Îtîla`atî ên rejîmê kir.

Navbirî di rojên despêka belavbûna nexweşîya "COVID19"ê de, bi belavkirina vîdyoyekê, hişdariyeyeke micid dabû xelkê ku, rewşa Kurdistan û parêzgeha Sîneyê ji aliyê belavbûna vîrûsa Koronayê ve gelek aloz e, lê navendên girêdayî, gotinên wî red kiribûn ku piştî derket, Dr. Yûsîf-pûr bi serastî bilindtirîn asta krîzê dîtibû, û yên ku înkara hebûna wê "êpîdemi"yê dikirin, derket ku wekî her carê, ji aliyê çewtekarên ve bûye, û di nûtirîn amaran de jî, Komîteya Gihandina Zanîyariyan ya Stada Birêveber ya Zanîstên Pîzîşkî, eşkere kiriye ku parêzgeha Kirmaşan di Rojhilatê Kurdistanê de yek ji wan parêzgehan e ku Korona bi awayekî berçav tê de belav bûye û rewş metirsîdar e.

Lewma dîr nayê dîtin ku di piroseyeke bişik ya din de, wekî wan senaryoyên ku bo piraniya çalakvanên siyasî, medenî û Jîngehparêz û... hwd bi rê ve birin, di demekê de ku armanca wan çalakvanan tenê gihandina zanîyariyan bo xelkê û zelalkirina bûyeran bûye, senaryoyên din ên weha jî dîsan bi rê ve bibin. Eva ev rewşa ye ku nayê înkarkirin, ku bi salan e li Îrana di bin deştîlata rejîma axundî û Spaha Pasdaran a terorîst de, tê dîtin.

Ew rejîma bona dirêjkirina heyama mana xwe, ji krîzekê bo krîzeke din baz dide û jiyan di civaka Îranê de, bûye "strêsek"eke berdewam û tirs ji diwartirbûna krîzan e.



## Sergotar

Dîrok dijî Mirovahiyê

N: Kerîm Perwîzî

Sîstema kolonyalîstî a hakim li ser netewên zilmlêkirî, ne tenê niha dagîr dike, belkî hewla têkdana dîrokê û çewtekariya raştiyan dide û bi watayekî din dagîrkeriya niha, hewla dagîrkirina dîrokê jî dide.

Di vê hizirkirina îdolojiyê de, dîrok wekî komek bûyerên raştî bas nayê kirin, belkî di navbera bûyerên derbasbûyî de hindêk ji wan hildibjêrin û bi mudaxilekirin bas jê dikin û li cem yek didanên û dîrokekî sexte lê diafirînin. Ew dîroka sexte û dîrewîn li ser bîngeha sedem û argomêntan ava kiriye, û bi vî awayî li ser bîngeha dîrew, dîrewêkê bi berdewamiya sîstemên diheqîqetên xwe divehûne.

Di wê metoda çewtekarî de, heta piştî nemana desthiladariya xwe jî, dîroka çewtekarî ya çendîn salan dûbare û çendbare bi nîşên welat re dibêje û niha her kes di Îranê de pirtûkeke dîrokî bi zimanê xeyre Farsî bixwîne, bi giştî hemû sihir û „cadû“ya dîroka dîrew ya Îrana baştan û sedeyên piştî wê jî bo wê derdikeve. Evên ku sîstema kolonyalîstî û bi nav rûnakbîrên girêdayî wê sîstemê, kesên wekî Firûxî li serdema Pehlewî û kesên ser bi Komara Îslamî jî yên wekî, Bêhnûd û Hecariyan û nivîserên Mêhrname û “Çeşm Endaz” û...hwd ne, ku bi talankirina mêjiyê mirovan di nav civatgeha çend netewî ya Îranê de bûye ku dîroka wê tijî fitne û pevçûn e ku bi awayekê rêk dêxin ku nasnameyeke cuda bo mirovan biafirînin.

Di wê nasnameya sexte de, dibe Kurd Pêşewa û Komara

## Peyama Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta roja Xwendekarên Kurd



**Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta roja Xwendekarên Kurd, pîzbahî li xwendekarên Kurd kir.**

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta roja Xwendekarên Kurd

12`ê Banemer, salvegera şehîdbûna “Îsmail Şerîfzade” û hevalên wî li hemaseya berxwedana mezin ya xotrên qehreman yên Demokrat

li salên 46-47`an digel rejîma Paşayetî a Îranê de ye, bi wê hilkeftê, ew roje wekî roja Xwendekarên Kurd hatiye diyarîkirin.

Di wê rojê de, tevî pîrozbahîkirin li tev Xwendekarên Rojhilatê Kurdistanê û Yekîyetya Xwendekarên Demokrat ya Rojhilatê Kurdistanê, em bejna xwe bona rêzgitin li şehîdên wan salan û hemû şehîdên doza rizgariya gelê Kurd ditewînin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îran  
Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

11`ê Banemer a 1399  
30`ê Nîsan a 2020

Kurdîstan û Partiya Demokrat bi deşkirda welatên bîhanî nas bike û Rizaxan û Xomêynî jî bi qehrimanên milî!  
Niha kesek wekî Zahîdê kurê kûdetaçiyê salên 1332`an, Qasim Silêmanî yê terorîst pê qehriman e!

Çewtekarî di dîrok de hatiye kirin, deştilata Madan, deştilateke pîs nîşan didin û deştilata Hexamenîşnan jî bi deştilateke cihê şanaziyê nîşan didin. Her di wê derheqê de ku deştilata Sefewî dikin bi şanaziya Îranê û deştilata Zendîyan jî bi aloz û cihê şermezariye!  
Eva ku cem xwediyê wê hizrê girîng e, dîroka sexte berhem tîne da ku mirovên niha pê kedî bike. Niha ne opozisyon û partiyên derveyî welat, belkî Komara Îslamî û deştiladarên wê rejîmê bixwe jî dizanin ku di paşerojê de ne dîr de, dibe serê xwe di hember guherînkariyeke mezin de şor bikin û Komara Îslamî jî dikeve nav mozeya tawanên deştilatdaran de. Lê niha jî demara kolonyalîstî ya jibîrkirin û dîdgeha wan ew hinde bihêz e ku dîbare dîroka sexte û hênceta nalokî di bîrûraya giştî de tê belavkirin, da ku wisa nîşan bide ku hekî Îran ji rewşa Sefewî û Hexamenîşnî bête derê, êdî karesat diqewime û dibe bi qiyamet!

Bi vî awayî rohnkirin û lihevgerêdan, mirov wekî bîngeha bîrkirin dananê, û mijara sereke mirov û maf û azadiya wê nîne, belkî bîrokeya baştangerayî û bi pîrozkirina sînorên deştekîrî dibe bibe bîngeh.

Dij bi yek û dijayetîkirin di vir de ye ku ew bîrkirinên wan wisa didine zanîn ku sînorên Îranê gelek berfirehtir ji niha bûye û heya lêwara Medîteranê çûye, piştî bi deştê zilhêzan, Îran hatiye biçûkkirin; Lê eva ku sînor bi ser wan de hatiye sepandin, niha heman sînorên sexte ya zilhêzan bi pîroz dizanin û mirovên nav wê cografiyayê pê tepese dikin!

Dîrok û sînor sexte, di îdolojiya kolonyalîstî de kirine bi bîngeha kirdar û bi navê pîroziya baştangerayî û dîrok û sînor ve dixwazin cehenemeke din bo netewên Îranê ava bikin. Stem û malwêranî di Îranê de berdewam dibe da ku wê demê şoreşek di hizr û boçûn xelkê de bête gorê û di cihê pîrozkirina dîroka çewte de, bîngeh li ser maf û azadiyên mirov û yeksaniya neteweyan bête danîn.



## Peyama kek Mîstefa Hicrî bi helkefta 1'ê Gulan'ê



Peyam wiha ye;

Bi helkefta roja cîhanî ya Karkeran, em pîrozbahiyê li hemû karkerên Îranê û bi taybet ên Kurdiştana Rojhilatê dikin û piştevaniyê ji xebata wan a ji bo dabînkirina mafên wan ên bînpêkirî ji aliyê rejîma Îranê ve dikin.

Serkeve xebata hevpar a pêkhatayên cuda û hemû neteweyan li Îranê.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsyarê giştî

Mîstefa Hicrî

1'ê Gulana 2020'an

**M**îstefa Hicrî lêpirsyarê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi helkefta 1'ê Gulan'ê roja cîhanî ya Karkeran peyamek belav kir.

## Peyama Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta roja Rojnamegeriya Kurdî

**L**êpirsyarê Giştî yê PDKÎ, "Mîstefa Hicrî", bi hilkefta salroja Rojnamegeriya Kurdî peyameke pîrozbahiyê rû bi rojnamevanên kêrhatî yên Kurd belav kir.



kêrhatî yên Kurd pîroz be.

Bi hêvîya wê rojê ku hemû rojnamevanên Kurd wekî

hemû rojnamevanên cîhana azad û pêşketî, li gihandina rastiyan bo xelkê azad bin û ti astengiyek li ser rêya berfirhekirina wê erka giring ya wan nemîne.

Partiya Demokrata Kurdiştana Îranê  
Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

3'ê Banemer a 1399 a Rojî  
22'ê Nîsan a 2020

Deqa peyamê wiha ye:  
Salvegera Rojnamegeriya Kurd, li hemû Rojnamevanên

## Rejîma Îranê mifaha xirab ji navê "Partiya Demokrat" werdigire

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, ku di nan xelk û civaka Kurdiştana de naveke cihgirtî ye û piraniya xelkê Kurdiştana piştevaniya wê dikin, rejîma Îranê mifahên xirab ji navê wê Partiyê werdigire.

Deşteyek ji kesên girêdayê rejîma Îranê di bajarê Urmiyê û devrên girêdayê wî bajarî de, bi navê PDKÎ, daxwaza alîkariyê ji xelkê û welatiyan dikin.

Heyama çend rojan e ku, deşteyek çekdarên nenaskirî di çiyayên deverên "Geliyê Qasimlo" û "Berandiz"ê de digerin û xwe bi navê Pêşmergên PDKÎ bi xelkê re didine nasandinê û daxwaza alîkariyê ji xelkê dikin.

Di vê derheqê de, çavkaniyeke agehdar bi malpera "Kurdiştanmedia"yê re ragi-



hand: "Ew deşteye girêdayê rejîma Îranê ye û bi navê Pêşmergên PDKÎ şevane diçine nav wan malên ku malbatên pêşmergan, şehîd û welatperweran e û daxwaza alîkariyê ji wan dikin.

Bo agehdariya xelkê Kurdiştana Îranê; Wan kesan ti pêwendiyek bi Partiya Demokrata a Kurdiştana Îranê re nîne û xelkê Kurdiştana ji dana her cure alîkariyêkê bi wan kesan re xwe biparêzin.



## Cezayek bê sînor bo dewletek bê yasa



N: Serbest Urmiye

Bi hatina meha Remezanê çavnehîriya vê hindê dihat kirin ku rejîma Îranê weke rejîmekê ku xwe bi reberê hemû alîgirên mesebê Şî'eyên cîhanê dizane û reberê xwe wate Weliyê Feqîh nûnerê xwedê piştî Îmam Zeman li ser erdê dide nasandin, hindekê bihayê bide yasa û hikmên ola îslamê û aliyê kê mî bi hurmeta meha Remezanê jî be pêşiya lehiya hikmên xwe yên bê ser û berê ya îdamkirinê bisekinîne. Da ku mîslmanên akinciyên wî welatî bi hurmeta wê rojî û Remezanê jî be, barê kul û keserên wan di bin siya rejîma îslamî de bo heyemekê sivik bibe.

Mixabin her wekî ku me di mijara xwe ya du hejmarên borî de anî bû ber bas, di rejîma Komara Îslamî ya Îranê de, îdam berî ku weke cezaeke yasayî were naskirin, pitir weke hikmeke xweser ya rejîmê ye. Ji ber ku rejîm jî bo paraştina desthilata xwe, pitir jî vê çendê ku bihayê bide yasa û zagonên hikûmetî û navneteweyî, girêdayî ye bi fetwaya melayan û têngihîştina wan li mijarê. Ew jî ber vê çendê ye ku sîstema welayeta Feqîh, sîstemek e ku li ser esasê çî zagonê dewletmedariyê û desthilata yasayî ya dewletî û navdewletî nehatiye damezirandin. Belkî li ser esasê alîgiriya jî tayê "Ceiferî yê Esna Eşerî" yê mesebê Şî'e xwe dide şirove kirin. Li gor şiroveyên wan jî ku tayek e li mesebê Şî'e û taybetî Îranê ye, hikmê xwedê divêt li ser erdê jî aliyê hikûmeteke Îslamî ve bimeşe ku rêberiya wê di heyamê nebûna îmamê dozdan wate Îmam Mehdî

de, dikeve stuyê "Weliyê Feqîh" ku bi nûnerê xwedê li ser erdê tê naskirin. Ji bilî vê hindê jî pisporên olî ku naznavên cuda hene weke "Siqet El-Îslam", "Hucet El-Îslam" û "Ayetûllah" her yek li gor asta pisporiya xwe erkdarê birêvebirina yasayê îlahî û hikmê "Weliyê Feqîh" di civakê de ne. Ji aliyê din ve jî alîgirên vî mesebî li ser vê baweriyê ne yan em bêjin anîne ser vê baweriyê ku hertim û di her qunaxekê de divêt li gor esla mesebî ya "Teqlîd", keseke pisporê olî ku li ser mesebê wan be, bibe rêber û rênîşanderê wan li dor pirsên olî û rojevê de. Di astê herî bilind de jî "Weliyê Feqîh" desthilateke reha û bê sînor li ser civakê heye. Bi kurtî li gor vê şiroveyê em bêjin, hemû yasa û zagon dibe berî hertiştî ji aliye wî ve werin pesendkirin, piştî bibin yasayên hikûmetê. Lewma bo encama her karekê berî her tiştî hewce ye ku bîr û raya melayên paye bilind an ku "Ayetûllah"an were zanîn. Di vir de jî danîna organeke xwedî desthilata bilindtir ji Meclîsa Şevra Îslamî ku navenda yasadaniyê ye, gotinên me dide selimandin.

Bala xwe bidenê ka çawan rejîmek ku xwe rebere hemû mîslmanên cîhanê deizane, zagonên Îslamê jî bin pê dike. Li gor baweriyên Îslamî û nemaze mesebê Şî'e, di nava mehên salê de çar meh hene (Receb, Zî El-Que`ide, Zî El-Hece û Miherem) ku weke mehên "heram" tî naskirin û felsefeya wan mehan wiha hatiye şirove kirin ku di heyamê wan çar mehan de şer û kuştin "heram" e û divêt were sekinandin. Wate nabe di wan mehên han de çî kes jî raştî mirinê were. Ji aliyê din ve meha Remezanê jî heye ku herçende yek ji wan mehên han nine, lê li cem hemû mîslmanan weke mehek e pîroz ji aliye "Reb El-Alemîn" ve tê zanîn û di civaka îslamî de weke meha lîxweşbûnê tê naskirin û divêt di vê mehê de hemû hewil werin danîn ku kes raştî zirarê, nemaze zirara jiyan li dest çûnê nehê. Li gor zaniariyan piraniya dewletên Îslamî



weke mînak dewleta Pakîstanê, bi xasmanî di meha Remezanê de çî hikmekî îdamê bi rê ve nabe. Lê di rejîma Îranê de kesên ku li gor yasaya mesebî gihîştine asta bilind a olî weke "Ayetûllah", dikarin li gor esla "Teqlîd" ya mesebê xwe hemû yasayekê tevî hev bikin û ya ku di berjwendiya wan de ye bi fetwayekê bikin yasa. Her di ve derheqê de melayê rejîmê yê ku herî navdar û cihê baweriyaya "Weliyê Feqîh" e, wate "Ayetûllah" Mekarim Şîrazî, birêvecûna hikmê îdamê heya di wan mehên ku di ola Îslamê de kuştin tê de heram hatiye kirin jî, helal dizane. Eva serbarê vê hindê ye jî ku di mijara borî de jî me anîbû ber bas ku berê ku hikmê Îdamê di yasaya Cezayê Îslamî ya Îranê de û di sala 1392'an ya Rojî de were pesendkirin, rejîmê bê hebîna çî yasayekî hikmê îdamê bi rê ve birîye. Her çend ku yasa han di çend cihan de jî dijberiya destûra bingehîn a rejîmê dike.

## Belgeyek bo naskirina rêberê mezin û çînek bi bandor



**N: Elî Munezemî**

Bo naskirina hindêk merivê mezin û têgihîştin li hizr û endîşeya wan, hindik caran tenê belgeyek têrê dike. Şehîd Îsmâil Şerîfzade yekek ji wan rêberê mezin ê gelê kurd e ku renge tişke wisa ya maddî yan bi nivîskî li paş xwe ve nehêştibe, lê rê û rêbazek li pey xwe ve hêlaye ku wek amajeyek bo mezinatî, têgihîştî û jêhatîbûna wî wek rêberê pragmatîst ê xwedî hizrek bilind bo me rênîşander e.

Şehîd Îsmâil Şerîfzade li hindurê nameyekê de ku bo şehîd Dr. Qasimlo şandiye, wek rêberê xwedî zanişt û têgihîştinek kûr û xwandinek realîstane ya pirsên siyasî, rewşa heval û partiya xwe, neteweya xwe, welatê Îranê wek yekîneyeke siyasî a fermî û rewşa xebata neteweyên bindest di cihanê de û metoda xebata wan bo xilasîyê bi şeweyek civan û rêkûpêk şirove kiriye û wek birêveberê lêzan û xwedî şiyar di warê mudîriyetî de, li ser bingeha ew têgihîştina ku li serî de me bas jê kir, û ew hêz û îmkantên li ber dest de heyî, asoya xebatê destnîşan dike û bo gihîştin bi wê armancê, rêya çareseriyê ya pêdivî destnîşan dike.

Ew nameya ku Şerîfzade bo dr. Qasimlo şandî, belgenameyeke girîng a dîrokî ye ku zaf data û zaniyariyê hûr li xwe girtine. Lêkolên warê dîrokê dibêjin ku di nava belgeyên taybet de, name yekek li belgelên herî girîng e ku bo lêkolînên zaniştî mifah jê tê wergirtin. Eva ku li pêwendî digel bikaranîna nameyan wek belge ciyê pirsîyara

ciddî ye, qasa baweriyê ye di navbera kesê birêker û wergir û radeya bandora taybetîbûn an jî fermîbûna nameyê ye ku girîngbûna wê wek belge derdêxe ortê. Ku wisa be, ew nameya bi sedema hindê ku birêker, “Şerîfzade”, sembola xwendekarên kurd di xebata netewî de ye û wergir jî, “dr. Qasimlo”, payebilindtirin rêberê hizrî û xwedî raman ê gelê kurd di sedesala bîstan de ye, girîng e ku wek belgeyek xwedî deng û biaxiftin mifah jê were wergirtin.

Di hundirê wê nameyê de çend xalên girîng ê girêdayî bi mudîriyet û birêvebirinê ve hene:

1. Rêz û hurmetdanîn bo têkoşîna hevalan li derveyî welat û bi wê hindê çêkirina motîvasiyonê cem wan bo kar û xebata zêdetir.

2. Tekoşîn bo derbaskirina Hizbê li dest rêberiya kilasîk a sunetî û dayna li xaba kar bi destê qata têgihîştî, pêgihîştî û rûnakbîre şoreşger.

Eger bi kurtî em bixwazin wê xalê zelal bikin, derdikeve ku Şerîfzade wek kesayetiyeke şoreşger, xwedî şarezayî û têgihîştin li zaniştê rêberîkirina rêkxistinê de, bernamê hebûye bo mudîriyetkirina serçaveyên merivî di nav şoreşê de ku ew karê han ne tenê di Kurdiştanê û nav Partiyên Kurdî de, belkî di wê serdemê li cihana modern û pêşketî de jî tiştek nû bû. Yanî ji aliyê derbasbûn li şeweya kevin û sunetî ya rêberiyê bo şeweyek modern û pêşketî li ser bingeha zanişt, Şerîfzade pêşengê rêberên kurd e.

3. Şerîfzade bo ew kesên ku layiqê rêberiya bizavê bin, çend krêtiriye û pîvanan destnîşan dike ku pêk hatine li: Dilsozbûn, têgihîştîbûn, pêgihîştîbûn, rewşenbîrbûn û şoreşgerbûn.

Armanc ji dilsozbûnê yanî li gorî berjevendiyeke şoreş û partiyê tevgeriyar û



pêştgirêdan bi wan tiştan ku bo xebatê girîng in û dûrketin li wan reftar û kiriyaran ku zirarê li xebat û têkoşînê re hene.

Armanc li têgihîştîbûnê yanî bûne xwediyê zanişt, derk û şî`ûr di pirsên girêdayî bi kar û xebata siyasî, rêkxistinê û xebata azadîxwazane de. Derk û famkirina hemû ew tiştên ku bi hêsanî nayên dîtîn û eger hat û meriv kete rewşek dijwar de, bikaribe tiştan û pêwendîya wan lêkbide û bi kûrî jê fam bike. Pêgihîştîbûn yanî hebûna tecrîbe û xwe pêgihîştandin di meydana emel de.

Rewşenbîrbûn yanî hebûna şiyarî lê fikirin û analîzekirina pirsan. Şoreşgerbûn yanî tekoşîn bo pêkanîna guhertinên bingehîn di civakê de.

Sermayeya her rêkxistinê li du pişkên sermayeya madî û sermayeya merivî pêk tê. Sermayeya merivî koma zanişt û şiyar û pîsporiya endamên rêkxistinê ji xwe ve digre ku bo pêşvebirina kar û xebatê bo gihîştin bi armancên rêkxistinê pêdivî ne. Ber hindê meriv dikare bêje ku her rêkxistinêk bi wî qasî ku xwediyê kesên şarezaya û xwedî zanişt be, hind dewlemendtir e.

Lê di karê rêkxistinê de, xencî zaniştê te`orîk, tecrîbeyên emelî jî giraniya xwe heye. Li bûna xwediyê zaniştê te`orîk heta bideştveanîna tecrîbeyê mewda û dûriyek di navberê de heye. Bo Hizbêkê ku li halê xebata şoreşgerî de be, îmkantên derfetên perwerdeya endaman jê re sinordar e û pêgihîştandinê ewên ku bikaribin erka rêberiyê

bigirin stuyê xwe, hîn zêdetir dem û îmkantên dixwaze û bi zehmettir e.

Lewma, Şerîfzade bi liberçavgirtina wan raştiyaneyê ku beşdariya qata xwendekar, têgihîştî û pêgihîştî di xebatê de û wergirtina erka rêberiyê bi girîng dibîne bo birêvebirina şoreşê bi şeweyek zaniştîyane di pêxema gihîştin bi armancê ku azadiya gel e.

Hebûna kesên pîspore û şehrezaya di nav rêkxistinê de dibe sedemê hindê ku hevkar wek berpirsariyê hevpar, li pêgihîştandin û parvekirina zanişt digel hev de, hewla bilindkirina pileya zaniştê hevdu bidin û eve jî bi xwe dibe sedemê çêbûna motîvasiyonê di nav endaman de û bilindbûna kalîteya xebatê di rêkxistinê de. Beşdariya qata xwendekar di şoreşê de etmoferekê jêhatî diafirîne bo fêrbûnê û mifahwergirtin li hevkarên wek serçaveyên pêdivî bo bideştveanîna zaniyariyan û bikaranîna wê fêrbûnê di karê rojane de.

Bilindbûna pileya zaniştî ya endaman dibe sedemê çêbûna seha xwebawerîbûnê di cem endaman û xwemandîkirina zêdetir di kar û têkoşînê de, cî bicî kirina deqîqtir ya erkan, hêsanbûna bernamedanîn bo fêrbûn û perwerdeya endaman û nermbûna endaman li dema guhertinên rêkxistinê de.

Bi kurtî em dikarin bêjin ku rola qata xwendekar bo rakêşana xelkê bo nav şoreşê, perwerdekirin û ragirtina wê sermayeya merivî, rolek sentral û girîng e ku dibe em jî bi liberçavgirtina şîretên şehîd Şerîfzade zêdetir di wî warî de kar bikin.



## Per û baskê terorê divê bêne kurtkirin



N: Nûredîn Sofizade

Dewleta Alman girûpa Hizbullah Lubnanê weke girûpekî terorîstî da nasandin û hemî çalakiyekî hizbullahê di Alman de qedexe kir û dehan kes ji endamên vê girûpê di Alman de destbiser kirin û dest bi ser heyî û malê Hizbullahê de girt.

Rejîma Îranê weke make û xwediyê Hizbullahê, berî her kesî hate ziman û qedexekirina Hizbullahê li Alman û destnîşankirina wê ya wek rêxistineke terorîst şermezar kir.

Hizbullah endamekî fermî û yasayî yê hikûmet û parlemana Lubnanê ye, çima rejîma Îranê xwe xwediyê vê dizane?

Yekîtiya Ewropa jî çiqas leşkerî ya Hezullahê wek girûpekî terorîst bi nav dike, lê para siyasî bi heman rengî nabîne.

Brîtaniya jî di meha Şibat a sala derbasbûyî de biryarek dabû û Hizbullah wek rêxistinek terorîst bi nav kiribû. Îsra'îl û Amerîka pêşwazî ji vê biryara Alman kirin, û hivî xwaştin ku welatên din yê Yekîtiya Ewropa heman helwestê nîşan bidin.

Çima Îran hinde pê acîz bû û bertek nîşan da?

Rejîma melayan di Îranê de bo midehê 4 dehikan e ku xwe bi ser Îranê de sepaniyê û desthilat bi awayê nerewa bo xwe qorix kiriye, berde-wam cehd kiriye ku bi heçî nirxekê be, vê desthilatê bo xwe biparêze.

Rejîmekî dîktator ku eva nêrîna vê be bona paraştina desthilata xwe, bê guman hewara dibe ber girtin, kuştin, tirsandin, û jinavbirina heçî dijberê xwe. Wê rejîmê her li destpêkê de cehd kir desthilat û hêjmoniya xwe ne tenê di Îranê de, belkî pel biavêje welatên dinê û bi taybetî welatên Rojhilata Navîn.

Lewma navê vê siyaseta berfirehtir kirina desthilata xwe jî dana, hinarde kirina şoreşa Îslamî, yanî desthilatdarên wê rejîmê xeyala çêkirina împatoriyeke mezin li deverê di serê wan de bû, gelek zû dest bikar bûn, û yekemîn karê rejîmê ev bû ku Xumeynî daxaz ji xelkê Îraqê xwaşt ku li dijî hikûmeta welatê xwe şoreşê bikin û sernixûn bikin, her eva bû ku hikûmeta Îraqê li hember wan şiltaxiyên Îranê, bê deng nema û aqibet şerê 8 sale di navbera wan 2 welatan de qewimî.

Rejîma Îranê bona gehîştina bi vê armanca xwe, dest kire çêkirina taqim û girûpên girêdayî bi xwe di nava welatan de, û berdana wan girûpan bo pêşîran desthilata wan welatan û nehêmin kirina deverê.

Yek ji armancên sereke ya rejîma melayan di Îranê de jî çêkirina girûpên terorîstî, di zaf welatan de eva bû ku, her dema bixwaze wan taqmanê weke kartekî givaşê li dijî wan welatan bi kar bîne, bona wergirtina çur û imtiyazan.

Her kîderê rejîma Îranê xwaştibe, bona çêkirina gefan, têkdana tenahiyê, encamdana kiryarên terorîstî, teqandin û terorê bi kar anîne, ji vê hindê zêdetir jî terora xebatkarên siyasî yê Îran ên dijberî xwe bi wan girûpan dane kirin.

Baştirîn mînak bona bikaranîna wan girûpane li dijî hêzên dijberî rejîmê û encam dana karê terorîstî, em dikarin amajê bi terora Mîkonosê bikin ku rejîma

Îranê bona şehîd kirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hewalê wî, endamên Hizbullah Lubnanê bikar anîbûn, ji 6 terorîstê ku bi sûçê encamdana terora mîkonosê ji aliyê polisê Alman ve hatine destbiser kirin, 5 ji wan erebê Lubnanî û endamê Hizbullahê bûn.

Ku wisa ye hekî çî Alman niha çalakiya Hizbullahê qedexe dike û radigehîne ku



Hizbullah girûpekî terorîstî ye, nasîyariya Alman li ser vê Girûpê taze nîne û wedigere bo dema terora Mîkonosê. Rejîma Îranê bi sedema bikaranîna wan girûpên terorîstî, heya niha dehan caran li astê navnetewî de hatiye şermezarkirin û bi şûdar hatiye naskirin.

Ev girûpên ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê di welatên cur bi cur de avakirine û wan bona berjewendiyên xwe bikar tîne, em dikarin amajê bi navê wan girûpan bikin: Hizbullah li Lubnanê, Hema li Feliştînê, Husî li Yemenê, Hizbullah li Erebiştanê, Spaha Bedr li Îraqê, Heşda Şe'ibî li Îraqê, Spaha Fatimi-yûn li Efxaniştanê, Spaha Zeynebiyûn li Sûriyê, Spaha Bervankar a hereman an ku mezargehên pîroze Şî'eyan li Sûriye û Îraqê, Hizbullah Sûriyê, gurdana Eb-ulfezl Ebas li Îraqê, gurdana El-Heq li Îraqê, Siraya Îslam li Îraqê, Sireya Xurasaniy li Îraq û Suriyê, Keta'êb Hizbullah li Îraqê, Keta'êba Îmam Elî, Keta'êba Seyd El-Şuheda, Herek El-Nuceba û dehan girûpên dinê.

Rejîma Îranê bona rêkxistin û mudîriyeta wan girûpane Spaha terorîstî ya Quds weke çiqek ji Spaha Pasdaran avakir ku kar û erkê vê berpirsayeriya wan girûpane ye li welatên dinê.

Rejîma Îranê bi çêkirin û rêkxistinê kirin û teyar kirina wan girûpane di warê malî û çekan de, bi eşkere piştevaniya wan kiriye, dahat û heyîya Îranê hem di pêxema piştevaniya ji wan girûpan de xerc kiriye û diket. Piraniya serweta Îranê bona teyarkirina wan girûpan tete xerckirin, di hember de jî ev jî li ser hêla berjewendiyê rejîma Îranê û siyasatên tev-daniya vê kar dikin.

Bi terorîst nas kirina Hizbullah Lubnanê û qedexekirina çalakiyên wê, bi dîtina min kurtkirina destê Îranê ye û lêdana per û baskê terorîzma rejîma Îranê ye.

Lê gelo ev cure helwestane dê bikarin givaşê bêxine ser Îranê ku desta ji tewdanî û şiltaxî û terorê bikêşîne?

Bê guman bersiva min heye, bi bawera min heya rejîma Komara Îslamî mabe, bi çî awayekê nahêle cîhan û dever xêr û xweşî û tenahiyê bi xwe ve bibîne, lewma bi qedexe kirin û terorîst nasandina girûpekî terorîstî a girêdayê rejîma Îranê, ev rejîma ne tenê desta ji teror û alozî çêkirinê nakêşe, belkî bona mana xwe dê gelek karên xirabtir jî bike û bona paraştina hêjmoniya xwe renga agir berde deverê.

Kite rêke û dermanê derdê hemî xemxwarên tenahiya Herêmê û dijberên terorê û alîgirên tenahiyê, sernixûniya rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî ye, bi nemana wê rejîmê, weke gorbîgorbûna maka terorê, êdî mirov dikare hivîdar be ku girûpên terorîstî yê weke Hizbullahê Êtîm bimînin û ji nav biçin û herêm rûyekî xweşî û aramiyê bi xwe ve bibîne.

Nerîna Lîderan



“Mike Pompeo”:

“Diz û çeteyên “Venezuela”yê şerîkê terorîstên rejîma Îranê ne”.



“Brian Hook”:

“Ecêb nîne ku rejîma Îslamî ya Îranê berevaniyê ji xelkê xwe di hember vîrûsa Koronayê de nake”.



Norî El-Malikî:

“Em rê nadine Amerîkayê ku di Îraqê de mudaxilê bike”.



“Ebas Mûsewî”:

“Em ê dê tola xwîna wan çekdarên Heşda Şe`ibî ku ji aliyê DAÎŞê ve hatine kuştin hildin”.

Rejîm dixwaze dîroka me ji nav bibe!




N: Eskender Ceiferî

Mîratên dîrokî, nasname û çanda her neteweyekê ne ku pêwîst e ji bo parastina hebûna wê neteweyê, ew şûnwarên dîrokî jî bêne parastin. Beşek ji vê berpirsyariyê li ser milê xelkê ye û beşa herî zêde dikeve ser dewletan.

Li bajarê Sine hin şûnwar hene ku ji ber nebûna alîkariyên hikûmî ji bo parastina wan, ber bi jinavçûnê ve diçin û hinek ji wan bi tamamî wêran bûne. Kolanên kevn yên Sine, bêhna xem-sariyê didin.

Nirxa şûnwarên dîrokî, girêdayî çawaniya avakirina wan û serdema wan e. Lê ji berpîrsên saziya Mîratên Deştî û Çandî yên Sine re girîng nîn e kîjan şûnwar, a kîjan serdemê ye. Ji wan re girîng e kîjan şûnwar zêdetir nêzîkî navenda bajar e ku wê biparêzin û nojen bikin, lê şûnwarên din paşguh dixînin.

Di vê derbarê de Nadir Zendî rêveberê endazyarên Mala Hunermendên Sine dibêje 60 heya 70 ji sedî malên kevnar ên bajarê Sine, nasnameyêke dîrokî hene û xwediyên taybetmendiyên di warê endazyariyê de ne. Di rîzbendiya avahiyên dîrokî de li wî bajarî, sê desteyên avahiyên dewletî, yên xelkê zengîn û yên normal hene. Beşeke zêde ji malên kevnar li wir ji kevirên taybet hatine çêkirin. Saziya Mîratên Deştî û Çandî jî ragihandiyê ku ewê hewlên xwe ji bo rêgirtin ji wêranbûna wan avahiyan xurttir bikin lê saziyên pêwendîdar, bûdceya pêwîst nadin wan. Dema ku bûdce tê mezaxtin, ji bo xaniyên kevnar ên dewletê tê xerckirin lê xaniyên normal ji



bo parastin û nojenkirinê, di rêza herî dawiyê de ne. Tiştê rast ev e ku malên kesên normal, dîroka bajar nîşan didin û pêwîst e ew mal jî bêne parastin.

Endazyariya normal, giraniyê dide ser jiyana rojane ya xelkê û Mala Hunermendên Sine jî, 90 ji sedî lîkolînên xwe di vê derbarê de encam dide lê nîva bûdceya karên wan tê dayîn; ji ber ku giraniyê nadin ser malên kevnar ên dewletê.

Nadir Zendî got ku di malên Kurdan de cîyekî taybet ji bo mêvanan tê terxankirin û di hemû malên kevnar ên welatiyan de Dîwanxane û kursiyên zivîstanê jî hene lê di malên kevnar ên dewletê de Dîwanxane û kursiyên zivîstanê tine ne. Bi vî rengî nojenkirina malên dewletê, nikare bibe sedema vejandina wê çandê. Endazyariya modern jî, ji bo pêşxistina civakê pêwîst e lê nabe endazyariya kevnar bê jîbîrkirin.

Hin malên kevnar hene ku di destên welatiyan de ne û dewlet jî qet bûdceyekê ji bo kirîna wan terxan nake.

Herwisa ji bo danîna projeya kişandina bala torîstan bi malên kevnar ve karek nehatiye kirin. Beriya niha hatibû ragihandin ku wê di wan malan de karmend bêne danîn ji bo ku torîst bikarin serdana wan bikin û dahata wan ji bo bajarê xerckirin. Lê hin malên kevnar li Sine hene ku xelkê tede dijîn û kesek jî nizane kevnar in. Tevî ku li Sine gelek malên kevnar û yên bi endazyariya Urusî hene û Mala Hunermendan jî daxwaz kiriye ku radeştî ciwanan bêne kirin ji bo ku tevî torîzmê bikin, lê saziya Mîratên Deştî û Çandî, bi hênceta rênedana yasayê, vî karî encam nade.

Ji ber ku welatiyan agahiyên pêwîst nîn in, heya niha gelek avahiyên kevnar hatine wêrankirin û malên modern li dewsa wan hatine çêkirin lê şaredariya Sine, li dewsa ku rê li ber wan bigire, bi rengê yasayî daxwazên wêrankirina wan malan erê dike.



## Qirkirina Kurdên Efrînê li ser destê çeteyan di bin dagirkeriya Tirkiyê de

### A: Rojava

Her ji roja dagîrkirina herêma Efrînê li 18.03. 2018 ve, tawanên dijemirov yên qirkirinê li dijî gelê kurd zêdetir dibin, ku li gorî sazîyên mafên mirovan ku zêdetir ji nîv milyon ereb û tirkumen û nêzîkî 20 hezar çekdarên çete li Efrînê hatine bicîh kirin, li gorî dezgehên medyayî û çalakvanên mafên mirovan ku her ji destpêka meha nîsana niha ve zêdetir ji 96 welatîyên kurd ji aliyê çeteyan ve hatine revandin, û çar kurd hatine kuştin piştî lêdanê û dizîna mal û malikê wan ji wan hemwelatîya kurd Fatima Kinê ya 80 salî û Elî Mihemed yê 74 salî.

Siyasetmedarê serbixwe û çalakvanê mafê mirov, serokê saziya dad parêzer Mîstefa Osso di daxuyaniyekê de piştraşt dike ku ev talan, dizî, kuştin û wêrankirin ..., tîne bi mebesta neçarkirina milletê kurd li ser çolkirina welatê xwe, herweha serokê saziya dad behsa rewşa xirab yên koçberên Efrînê li kampên penaberîyê dike ku hevdem ereb û tirkumen li ser mal û milkên wan hatine bicîh kirin.

Mîstefa Osso, Tirkiyê wekî welatekî dagîrker bi berpirsiyariya van tawanên li herêma Efrînê gunehbar dike û dibêje ku Tirkiyê berpirsiyar e li hember kiryar û sîcên li herêma Efrînê, ku Tirkiyê li gorî peymanê Hagê ya salên (1899 - 1907), welatekî dagîrker e, tevî ku ti biryarek fermî nehatiye dayîn.

Osso dibêje ku ev tawan çar Peymanên Cenevrê yên sala 1949'an bînpê dike ku guhertina demografî bi tawanên şer tê hesabdan, û sîstema Romayê ya sereke ya ku dadgeha tawanên Navnetewî li sala 1998 li ser hatiye damezrandin piştraşt dike ku kiryarên bi vî rengî li gorî bendên (6, 7, tawanên dijemirov in, û ew tawanên jenosîde ne li gorî benda (2) ya peymanê qedex-

ekirina jenosîde, ku ji hêla Netewên Yekbûyî ve di 9ê mijdarê de hatibûn pejirandin.

Li hemberî bédengiya NY û sazîyên wê li ser tiştê ku li Efrînê diqewime, Mîstefa Osso dibêje: her çend ku gelek belge li ser tawankariyên Tirkiyê û çeteyên wê (Artêşa Niştîmaniya Sûrî) hene, ji wan tawanên kuştinê, girtin, îşkence, revandin, dizî, talankirin, guhertina demografî, û herweha ligel gelek bangewazî û raportên ji sazîyên mafên mirovan yên Kurdî û Erebi û Navnetewî, bi taybetî raporên ji hêla (Human Rights Watch) û (Amnesty International), û herweha gelek civînên û belge û şahidên qurbanîyan, ji hejmarek rêxistinên mafên mirovan yên Kurd û Sûrî ve, ku helwesta NY û sazîyên wê yên mafên mirovan, li asta berpirsiyariya berpirsiyariya qanûnî û mirovahî nîne, ku li gorî yasa mirovahî ya navnetewî wekî sîcên dijemirov û sîcên şer tene hejmartin.

Mîstefa, NY û sazîyên wê wekî hevparên tawanbaran dibîne û tekez li ser giringiya bidawîkirina vê jenosîd û qirkirinê dike û daxwaza dadgehkirina tawanbaran li pêş dadgeha tawanên navdewletî wekî tawanbarên şer dike.

Li aliyekê din, çalakvana mafê mirov, û berpirsa saziya Ezdina, Mîdya Mehmûd di daxuyaniyekê de got ku jin û keçên kurd li Efrînê rastî êrîşên kuştinê, revandin, îşkence û tundûtûjiya cinsî tîne, û li gorî tîmeka çavdêriya saziya Ezdina ji hundirê Efrînê ku tenê di nava şeş mehan de, şeş keçên êzîdî ji aliyê grûpên îslamî yên tundrê ve hatine desteserkirin û revandin ji wan Roya Mîstefa ya (15 salî), û Arîn Hesên (21 salî) ku li 27.02.2020 ji aliyê "artêşa niştîmaniya sûrî" û li pêş çavê artêşa tirkiyê hatibû revandin û heta niha çarenivîsa wê diyar nîne, herweha Mîdya Mehmûd behsa revandina gelek keçên din dike ji wan Xizalê ji gundê Birc evdalo, Newroz Xelo, Nêrgiz Dawid ya (24 salî) ..., herweha Mîdya dibêje ku hejmar ji vê yekê zêdetir û sazîyên mafên mirovan ji ber rewşa dijwar ya li Efrîn nikarin bi awayekî baş hemû tawan û bînpêkirinên diqewmin bi belge û dokument bikin.



Herwiha rêxistina Mafên mirov li Efrînê li ser malpera xwe li ser (Facebook) ragihand ku welatîyên kurd heta ji alîkariyên mirovî yên NY tene bêpar kirin û bi tenê li ser hawirdên ereb û tirkumena tene dabeşkirin.

Bi vê yekê xuyaye ku dagîrkeriya Tirkiyê ne wekî ti dagîrkariya ye, yekser wekî gotina nivîskarê Fransayê yê navdar Victor Marie Hugo (1802-1885) ye dema got: ku "Tirk di vê derê re derbas bûn û her tişt bû kavil û biyaban".

Hêjayê gotinê ye ku herêma Efrînê bi navê çiyayê kirmanc jî tê binav kirin û herêma çiyayê kirmanc ji heft bajaran (Efrîn, Şera, Şiyê, Cindêris, Raco, Bilbilê û Mabatlê) û 366 gundan pêk tê û



## Du welatîyên bajarê Şinoyê bi sedema bombebaran balafirên şer yê Tirkîyê canê xwe ji deşt dan

**R**oja Sêşemî 28`ê Nîsanê, balafirên şer ên Tirkîyê, bilindahiya çiyayê “Xwakurk”ê li ser sînorê Herêma Kurdiştanê bombebaran kir û di wê bombebaranê de du welatîyên Kurd ên xelkê bajarê Şinoyê yê bi navên, “Faxir Tazê Warid” ê 35 salî û “Reşîd Pîrutî” ê 36 salî, canê xwe ji deşt dan.

Ew du welatîyên Kurd ên xelkê bajarê Şinoyê, bi mebesta komkirina giyayên biharê serdana bilindahiyên “Xwakurk”ê kiribûn û ji aliyê balafirên Tirkîyê ve hatine bombebaran kirin.

Heya niha termê wan du welatîyên Kurd radeştê malbatên wan nehatiye kirin.



Çiyayê Xwakurkê dikeve di navbera bajarê Şinoyê ya Rojhilatê Kurdiştanê û

Soran li Herêma Kurdiştanê û navçeya Colemêrg a ser bi Bakurê Kurdiştanê.

Piştî şikesta gotûbêjan di navbera dewleta Tirkîyê û Partiya Kirêkar a Kurdiştanê, PKKê de, şer û pevçûneke dijwar di navbera hêzên Tirkîyê û PKKê, di wê navçeyê de rûy daye û berdewam e.

## Kuştin û birîndarbûna du kolberên Kurd li bajarên Serdeşt û Çaldêranê

**Ê**vara roja Şemî 13`ê Banemerê, hejmarek ji Kolberan li bilindahiyên sînorê “Nokan û Kanî Zerd” a girêdaya bajarê Serdeştê, raştî borseya hêzên leşkerî ên hikumetê hatin û di encama teqeyên hêzên leşkerî de, kolberek bi navê “Mihemed Îbrahîmzade” ê temen 37 salî û xelkê gundê “Nebî Ava” a ser bi bajarê Rebetê, canê xwe ji deşt da.

Hêzên leşkerî yê hikumetê bi bê agehdariya berê û di heyamekî kêma de, teqeyên wan kolberên Kurd kirine.

Her di vê pêwendiyê de, li heyama rojên derbasbûyî de, kolberekî din ê bi navê “Sidêq Ehmedî” li bilindahiyên gundê “Wekîl” a ser bi bajarê Çaldêranê bi teqeya hêzên leşkerî yê hikumetê birîndar bû û bo tedawiyên pîzîşkî bo nexweşxaneyê hatibû veguhas-tin.

## Zêdetir ji yek sal e ku qedera ciwanekî Kurd nerohn e

**C**iwaneke Kurd piştî 1 sal û 5 rojan, hêj qedera wî nerohn e û binkeyên ewlehî yê rejîmê piştî heyamekê binçavkirina wî red kirine.

Ciwanê Kurd yê bi navê “Ferîd Pejûhî” ku ji Xezelwera sala 1397`an ve li bajarê Merîwanê bêserûşûn bibû, heya niha ti zanyariyek li derheqê wî ciwanê Kurd ji ber deşt nîne û tevî wê yekê ku di deştê de binkeyên ewlehî yê ser bi rejîma Îranê bas ji binçavkirina wî kiribûn, piştî derbasbûna heyamekê ji ser binçavkirina navbirî re, navendên ewlehî yê rejîmê niha wê yekê red dikin.

“Ferîd Pejûhî” di sala 1373`an de ji dayîk bûye û xwendekarê tîrma dawî a Karnasî ya Endazyariya Avedanî a Zanîngeha Azad a bajarê Merîwanê ye.

Malbata “Ferîd Pejûhî” di deştê de bêserûşûnbûna kurê xwe de bi alîkariya hindêk kesan agehdar dibin ku ew hatiye binçavkirin û di girtîgeha bajarê Sineyê de hepsî ye.

Berpîrsê Agahî a rejîma Îranê li bajarê Merîwanê bi malbata “Ferîd Pejûhî” re gotibûn, ku ew zindî ye lê bi hegera ewlehîbûna wî, nabe ji wî yekê zêdetir li pey bikevin.

Îdareya Ewlehî ya rejîma Îranê, niha red dike ku kesekî wiha di girtîgeha wê îdarê de ye.

## Du welatîyên xelkê bajarê Şinoyê ji aliyê hêzên îtila`atê ve hatine binçavkirin

**D**i heyama çend rojên derbasbûyî de, ciwanekî Kurd yê bi navê “Alan Bengîn” yê temen 21 salî û xelkê gundê “Kanîreş” a ser bi bajarê Şinoyê, di dema serbaziya de ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhas-tin.

Piştî binçavkirina wî ciwanê Kurd, ciwanekî din yê xelkê wî gundê yê bi navê “Yehya Îbrahîmî” yê temen 20 salî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û ew jî bo cihekî nexuya hate veguhas-tin.

Hêzên ewlehî di gundê Kanîreşê êriş kirine ser mala wî welatîyê Kurd û deşt bi vekolîna mala navbirî kirine û herwisa hindîk ji kelûpelên wî yê wekî Kampiyûtera û hin tiştin dinê de girtine û digel xwe birine.



Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û cihê girtina wî welatîyê Kurd ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.



## Hunermend Kazo di Qerentînê de ye û rewşa wî baş e

**D**engbêjê navdar ê Kurd Kazim Şîrvan, ku di nava gelê Kurd de bi “Kazo” tê naskirin, pêka nûçeyan hatine belavkirin, navbirî bi vîrûsa Koronayê ketiye û hatiye zanîn ku niha rewşa wî baş e.

Roja 13`ê meha Nîsanê, hate ragihandin ku hunermendê Kurd ê navdar Kazo bi vîrûsa koronayê ketiye û vê demê ve li nexweşxanê di bin çavdêriya pizîşkî de bû.

Ew hunermendê Kurd piştî wergirtina çareseriya pizîşkî li nexweşxaneyêke taybet li bajarê Stenbolê, niha di mala wî xwe de têtê tedawîkirin û li ser raspartiya pizîşkan heya heyamekê dibe her di bin çavdêriya de be û xwe ji kesûkarên xwe cuda bike.

Kazo bo heyamê 14 rojan di nexweşxanê de hatibû qerentînekirin, ku carekî dinê ceribandina pizîşkî, encam dîsan erênî derket, lewma dibe bo heyamê 2 hefteyên dinê di mala xwe de bê qerentînekirin.

Dengbêj “Kazo” bi rêya girte vidiyoyekê re ragihand ku rewşa tendirustî ya wî baş e. Hunermendê kurd basê wê yekê jî dike, li nexweşxaneyan gelek kes berxwedana jiyane dikin û got: “Ku bi bawerî bi xwe bûnê mirov dikare bi ser wê nexweşiyê de ser bikeve.” û navbirî bi saya piştevaniya xelkê baştir bûye.

Hunermend Kazo spasiya xwe pêşkêşî hunermend,



siyasetmedar û her kesî kir ku di vê qonaxê de piştevaniya wî kirine.

Rêzan Şîrvan got ku dayîk û bavê wê, di mala xwe de û di odayên cuda de, hatine qerentînekirin û ragihand, ku rewşa wan baş e û hefteyek maye ji bo tewawbûna qerentînê.

## Hunermendê navdarê Kurd Seîd Gabarî koça dawiyê kir

**H**unermendê mezin û binavûdeng ê Kurd, Seîd Gabarî bi sedema nexweşiya penceşêrê li yek ji nexweşxanên bajarê Hewlêrê de koça dawî kir.

Seîd Gabarî di 13`ê meha Nîsan a 1956`an de li gundê Xirbê Kejê girêdayê bajarê Heskê li Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bibû.

Seîd Gabarî di heşt saliya xwe de deşt bi hunera Kurdî kiriye û gelek bi dijwarî jiyana xwe derbas kiriye heya mezin bûye.

Seîd Gabarî helbestvanên Kurd yê wekî, Seyîdayê Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj, nas kirine û dehan helbestên netewî yê wan kirine ştran û bi dengê xwe û bi lêxistina tembûra xwe, ew ştran pêşkêşî gelê xwe kirine.

Seîd Gabarî bi deng û tembûra xwe sedan ştranên şoreşvanî û netewî tomar kirine û bo gelê xwe bi cih hêlan.

Herçiqas ew kor bû, lê bona doza Kurd xwe kêmas nezani û tevlî şoreşê bû û bi ştranên xwe seha pêşmergan bilind dikir.



Seîd, gelek caran ji aliyê hikûmetên Be`is a Îraq û Sûriyê ve hate binçavkirin û kete hepsê û hate îşkencekirin.

Seîd çen salekan wekî penaber li Zêweya Urmiyê jiyaye û bi sedema ştranên şoreşgerî ji aliyê rejîma Îranê ve kete ber gefê û bo bajarên naverasta Îranê hate dûrxistin.

Seîd Gabarî bi dehan ştranîn şoreşgerî û evîndarî gotin. Hunermend Seîd Gabarî ji ber zextên siyasî ew neçar ma ku derkeve Ewropayê. Navbirî gelek caran li Başûrê Kurdistanê dima.

Ev hunermendê mezin roja 4`ê meha Gulan a 2020`an bi yekcarî xatrê xwe ji gelê xwe xaşt û çû ber dilovaniya xwe.



## Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

### Zeyneb Celaliyan bo girtîgeha Qerçekê hate veguhaştin

Roja Şemî 13`ê Banemerê, “Zeyneb Celaliyan”, hepsiya siyasî a Kurd a xelkê bajarê Makoyê, bo girtîgeha Qerçek a bajarê Weramînê hate veguhaştin.

Ew hepsiya siyasî, roja Çarşemî 10`ê Banemerê, di girtîgeha bajarê Xoyê de bo girtîgehên bajarên Urmîyê, Kirmaşan û Evîn a bajarê Tehranê hate veguhaştin.

Çavkaniyên nêzik ji malbata Celaliyan bas ji “hegera dosiyasaziyeke nû bo Zeyneb û veguhaştina wê bo bajarê Tehranê bo lêkolînê” dikan.

Heyamek beriya niha, Saziya lêxweşbûn a Navnetewî daxwez ji berpîrsên hikûmeta Îranê kiribû ku dawî bi hepsiya nadadperwerane ya Zeyneb Celaliyan bînin.

Ew hepsiya siyasî rêketa 20`ê Reşeme ya sala 1386`an, li bajarê Kirmaşanê ji aliyê hêzên Îranê ve hatibû binçavkirin. Piştê di Sermawez a sala 1388`an, bi tohmata (Muharibe) û endambûn û alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdistanê, bi sêdareyê hatibû cezadan û piştê bo hepsa heta hetayî hate guherîn.

Cezaya lisêdaredana wê hepsiya siyasî, di meha Banemer a sala 1388`an ji aliyê dadgeha pêdaçûnê hate piştraştîkirin, lê piştê di meha Sermawez a sala 1390`an li ser biryara lêbûrîna rêberê nîzamê, bo hepsa hate guherîn û kêmkirinê.

“Zeyneb” sala 1361`an, di bajarê Makoyê ya ser bi parêzgeha Urmîyê de ji dayîk bûye.

### Welatîyekî Kurd piştî binçavkirinê bo cihekî nexuya hate veguhaştin

Roja Şemî 6`ê Banemer, welatîyek bi navê “Cemîl Xadim” yê temen 42 salî, ji sêrêya “Sêro” a ser bi bajarê Urmîyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin û bo cihekî nexuya hatiye veguhaştin.

Hêzên ewlehî sebaba binçavkirina wî ciwanê Kurd, “alîkarî digel yek ji Partiyên Kurd yê dijberî hikûmeta Îranê” dane zanîn. Heya dema belavbûna vê nûçeyê, lipeyketina malbata “Cemîl Xadimî” bo agadar bûn li qeder û cihê navbirî bê encam maye.

### Çar çalakvanên Kedkarî ji aliyê navendên Îtila`atê ve hatine gazîkirin

Roja Çarşemî 10`ê Banemerê, li nêzîbûna roja cîhanî ya Kedkaran, Îtila`ata Spaha Pasdaran li bajarê Sine du çalakvanên Kedkarî û du kesên din ên bi navê, “Mizefer Salihniya” digel hevjinê wî bo wê navendê gazî kirin û lêpêçîn digel wan kir.

Ew du çalakvanên Kedkarî, piştî çar demjimêr lêpêçînkirin, ji Îtila`ata Spaha Pasdaran a bajarê Sineyê hatine berdan.

Ji aliyê din ve jî, di heman rojê de, du çalakvanên Kedkarî yê bi navê “Ramîn Kerîmî û Yûsif Giramîperwer”, ji rêya telefonî ve bo îdareya Îtila`atê hatine gazîkirin.

Îdareya Îtila`ata bajarê Sine, ew du çalakvanên Kedkarî, bi sedema wê ku di roja cîhanî ya Kedkaran de amadenabin û çalakî bo wê rojê nekirine, ev bo wê navendê gazî kiribûn.

Navendên hikûmetî yê Îranê, hemû salekê di Kurdistanê de hejmarek ji çalakvanên Kedkarî bo navendê xwe gazî dîke û lêpêçînê digel wan dîke.

### Welatîyekî Kurd di bajarê Sewlavayê de hate binçavkirin

Roja Şemî 13`ê Banemerê, welatîyekî Kurd yê bi navê “Ebdullah Edwayî” ê xelkê gundê “Silên” di devera hewraman a ser bi bajarê Sewlavayê de bi awayekî nexuya hate binçavkirin û hêzên Îtila`ata Spaha Pasdaranê navbirî bo cihekî nexuya veguhaştine.

Piştî neçûna wî welatîyê Kurd bo navenda Îtila`ata bajarê Sewlavayê, hêzên Îtila`atê êrîş kirine ser gundê “Silên” û navbirî binçav kirine.

Roja Duşemî 24`ê Befranbar a sala 1397`an, ew welatîyê Kurd bo Saziya Spaha Pasdaran li bajarê Sewlavayê hate gazîkirin û piştê binçav kirin, û di rêketa 8`ê Reşeme ya heman salê de bi danîna barimteyê hate azadkirin.

Ew welatîyê Kurd, meha Gelawêj a sala 1398`an, ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Merîwanê ve bi tohmata “alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd yê dijberî hikûmeta Îranê”, bi salek hepsa te`izîrî û piştî nerizayeti derbirîna wî welatîyê Kurd li derheq cezaya xwe, ew cezaye bo dadgeha pêdaçûnê hate şandin.

# Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ [www.Kurdistanmedia.com](http://www.Kurdistanmedia.com)
- ◆ [www.Agirimedia.org](http://www.Agirimedia.org)
- ◆ [rojnamaagiri@gmail.com](mailto:rojnamaagiri@gmail.com)
- ◆ [www.facebook.com/Agirikirmanji](https://www.facebook.com/Agirikirmanji)


Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: [Agiri2003@gmail.com](mailto:Agiri2003@gmail.com)

Hejmar (373)

## Xwendekarê Kurd zanîngehê dike çepera berxwedanê



## *Xwendekarê Kurd zanîngehê dike çepera berxwedanê*



Dezgeha Ragihandina Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê

Media Department Of Kurdistan Democratic Party of Iran